

Dibistana  
swêdî ji bo  
kesên nûhatî

Nordkurdiska



Ji bo zaroka te ya 1-6 salî


# Pêşdibistan û sinifa pêşdibistanî



*Skolverket*



# Dibistana swêdî ev e



Zaroka te dikare ji roja ku 1 salîya xwe tije dike biçê pêşdibistanê. Li pêşdibistanê lîstin girîng e. Dema zarok dibe 6 salî dikare dest bi sinifa pêşdibistanî bike. Çûna hem pêşdibistan û hem jî sinifa pêşdibistanî bi dilxwazî ye.

Hemû zarok ji 7 salî û pê ve diçin dibistana bingehî ya ku mecbûrî ye. Erka dibistanê ji bo sinifên 1-9 derbas dibe, yanî neh sal.

Piranîya ciwanan pişt re sê salen din jî diçin lîseyê. Kesên nû hatine Swêdê xwediyê wî mafî ne ku piştî wergirtina destûra rûniştinê ya daîmî hetanî dawîbûna wê dewreya biharê ya ku temenê 20 salî tije dikin dest bi lîseyê bikin; penaxwaz, berîya 18 salî tije bikin. Lê ji bo notên pejirandî hin şert têne ferz kirin. Lîse dikare şagird hem amadeyê zaningeh û dibistana bilind û hem jî xebata yekser bike.


# Kê dikare biçe pêşdibistan û sinifa pêşdibistanê

**Kar dikî yan dixwî?** Wê demê zaroka te dikare ji 1 salî û pê ve seranserê rojê biçe pêşdibistanê. Ev mafekî ye. Heger tu kar nakî yan jî naxwî dîsa jî zaroka te dikare ji 3 salî û pê ve her roj çend saetan biçe pêşdibistanê.

Dema zarok 6 salî tije dike xwedî maf e ku biçe sinifa pêşdibistanê. Ev jî bo hazirîya dibistana mecbûrî destpêkek bi dilxwazî ye. Zarok rojane sê

saet diçe perwerda ku li lokalek li hundirê yan jî li nezê dibistanê ye. Heger tu kar dikî yan jî dixwî wê demê zarok dikare wexta mayî ya rojê biçe mala dema vala.

Zarok rojên dûşem ta îne diçin pêşdibistanê yan jî sinifa pêşdibistanê. Şemî, yekşem û rojên tatilê serbest in.



# Mesrefa wê çi ye?

**Bê pare ye.** Heta zaroka te bibe sê salî danîna rojane sê saet li pêşdibistaneke fermî bê pere ye (belaş e). Lê heger bixwazî zaroka xwe berya sê salîya wê/wî deynî pêşdibistanê yan jî ji sê saetan zêdetir

deynî wê demê gerek e tu pare bidî. Ya asta xercê xuya dike şaredarîya te ye. Lê mesrefa çûna sinifa pêşdibistanê tune ye, ew belaş e.

Xerca herî zêde

0:-

0:-



**Pêşdibistan 1—6**

Şaredarî xercê destnîşan dike



**Pêşdibistana fermî 3—6 salî**

3 saet belaş e



**Pêşdibistan 6—7 salî**

Belaş e

# Hedefa pêşdibistanê

**Pêşdibistan berî her tiştî** ji bo pêşkeftina zaroka te kar dike û ji ber ku ew karibe zarokên din bibîne. Lê ev di heman demê de derfetê dide te jî ku tu kar bikî yan jî bixwînî.

Li pêşdibistanê lîstîk ji bo pêşkeftin û hînbûna zarokan girîng e. Zarok diceribîne ku bi stirandin, dans, resim û boyaxkirinê xwe îfade bike. Ziman

girîng e, hem zimanê swêdî û hem jî zimanê zikmakî. Her weha kultur û çanda meriv jî.

Pêşdibistan gerek e ewle, bi keyf û hîndekar be. Bingeha xebata pedagojîk ew e ku hemû însan xwedî heman rûmetê ne û keç û law ji bo pêşkeftinê xwedî derfetên wekhev in.

## Hedefa sinifa pêşdibistanê

**Dema zaroka te dibe 6 salî** mafê wî/wê ye ku biçe sinifa pêşdibistanê. Armanca sinifa pêşdibistanê ew e ku pêşkeftin û hînbûna her şagirtêkî teşwîq bike û wan amadeyê perwerdeya berdewamî bike.

Bi vî re rê li ber pêşkeftineke harmonîk ya şagirtan veke. Leyîstin û afirandin beşên girîng yên vê xebatê ne. Xala destpêkî ya perwerdeyê nêrîneke gîştî ya di ware şagirt û pêdiviyên wî/wê de ne.



## Pêşdibistana serbest yan jî ya şaredarîyê

**Şaredarî berpirsiyar e** ku zaroka te li pêşdibistanek were bicîhkirin.

Heger dixwazî zaroka te li pêşdibistanek were bicîhkirin serî li şaredarîyê didî. Wê demê şaredarî mecbûr e ku di nava çar mehan de, heta ji dest tê li nêzî mala te, ji bo zaroka te cihekê pêşkêş bike.


Tu dikarî di navbera pêşdibistanên şaredarîyê û yên serbest de hilbijartinek bikî. Pêşdibistanek dikare ji aliyê dê û bavan, personel û xebatkar yan jî şirketan ve were rêvebirin. Şertên tene ferzkirin wekhev in, û erka şaredarîyê ye ku zaroka te ewle be û bi awayeke baş li wê/wî were nêrin.

# Tu girîng î

**Pêşdibistan û sinifa pêşdibistanî** ji bo zaroka te heye. Têkiliya rojane girîng e. Her cara ku tu zarok datîni û tîni malê mamosteyên pêşdibistanê û mamosteyên din li derbarê rewşa zarokê de te agahdar dikin. Her weha bi xwe jî jibîr neke ku personel di derbarê wan tiştên li ser zaroka xwe de agahdar bike ku divê ew pê zanibin. Û heger pirsên te hebin, texsîr neke wan bipirse.

Salê çend caran dê derfeta te hebe ku tu bi tenê bi mamosteyan re biaxivî û zanibî ka zaroka te ji pêşdibistanê çiqas memnûn e û pêşkeftina wî/wê çawa ye. Di civîna dêûbavan de jî mamoste û dêûbav li hev kom dibin û li ser xebata li pêşdibistanê û tiştên tene plankirin diaxivin.





Den svenska  
skolan för  
nyanlända

**Beställningsuppgifter:**

Fritzes kundservice  
106 47 Stockholm  
Telefon: 08-690 95 76  
E-post: skolverket@fritzes.se  
www.skolverket.se

**Beställningsnr:** 15:1453

**ISBN:** 978-91-7559-167-4

**Bilder:** Folio, Michael McClain,  
Matton, Johnér, iStock

**Illustratör:** Helena Halvarsson

**Grafisk form:** Jupiter Reklam

**Grafisk produktion:** Space360

**Översättning:** Space360

**Tryck:** Lenanders Grafiska, 74088

*Skolverket*

skolverket.se/nyanlanda